wan bi çi wekî mirovan jî rîjîma Turkîyê ru neda wan. Her wek ku dîlîn şer bûn bi grew hatibûn girtin. Li Mêrdîn, Diyarbekir û Mûşê bîneçîyêna sitarê nîşan da û çend kon û hînek xwarin û wexarin da wan, tu heqek penaberî li kurdanra nas nekir. Kurdêna hatî di kanpêna xweda her wek hêşîr û dîla di nav neçarîyêda xwe ji bombêna kîmyayê parastin. Lî bextreşîya kurdâ li vir jî domand. Lewra gelek car hêzîn ewlekarîya Turkîyê jehrî û dermanê mirinê avîtine nav xwarin û vexwarina kurdan penaber û her weha serok û pêşmergêna hatî bi dizî û xef-xef dane rîjîma zordesta Iraqê. Mixabin, ev hemû hovîtî û qirkirin bin çavê cîhanê didomîya û kesek pêşî li vê rewşa xerav û ne mrovî nedigirt. Denk, ji bîr û raya cîhanê û bi taybetî ji hêzîn pêşverû û dêmokratîn Turkîyê jî dernediket.

Kesî li halê kurda nedipirsîya

Bi rastî jî, buyera Helepçê kezîyake gelekî mezine. Careke din

Newroz cejna dîrokîye



Bêwar
Barî Teyfûrî

Di nav gelên rojhilate nêzîk û navînda gelê kurd yê herî kevnare. Kurda di dîroka van herêmarda dewseke (sopeke) berbicav hîstine. Ev gelê kevnar û mîrxas kareke mezin daye çand û dîroka gelên cuda û pêjdaçûyîn, dewlemendbûna kultûr û menevîyata wanda roleke girîng leyîstîye. Dibêjin gelê bê çand bê kesayete. Her cejin, merasim, urf edet nexsêke çanda gele, him jî pareke bingeha çanda netewî ya dîrokîye.

Her gel jîyanêda anegorî menevîyata xwe çanda xwe çêdike. Cejin, merasim û li vanava girêdayî erf-edetên cuda-cuda di pêş ketina çanda netewî û cîvakî da roleke geleki mezin dilizîn. Di van cejin û merasimênda helwesta mirovan dereqa jîyanê tê xuya kirinê. Heyam tê dubuhurin hinek cejin, eydîn kevn an wêneyên xwe dugeherin, an jî ji

Каждому курду понятно, что это начало Нового года. Каждому русскому тоже станут понятны эти слова, если он прислушается и услышит, что "нав" - это новый, а "ruz" или "рож" - это Солнце, та самая "Жар-птица", за которой часто охотятся в русских сказках. Сегодня она приходит сама. Наступает новый год. Мы как будто бы отстаем от других народов, поскольку все уже отпраздновали наступление нового года, а у нас он приходит даже позднее, чем в Китае, в момент весеннего равноденствия - 21 марта. Мы сохранили этот обычай, насчитывающий многие тысячи лет от наших предков. Он прост и понятен, пришла весна, начинается новый год с его заботами и радостями. Почему мы, несмотря на то, что в нашей жизни случается многое, и, к сожалению, пока еще много трагического и печального, радуемся этому празднику. Потому что нельзя иначе встретить возвращение солнца, весну, начало полевых работ, пробуждение природы.

Эта весна для нас не только трагична, но и полна надежд. Курдам удалось прорвать многовековую блокаду и заявить о себе в полный голос. Победа демократии в Южном Курдистане, где курды сумели наладить нормальную жизнь, дает много. Она показывает, что курды выстояли, несмотря на все испытания, когда мы как народ иногда были на грани исчезновения, когда против нас проводилась, а в таких странах, как Сирия все еще проводит-

bîra gel dertêñ. lê hinek cejin, eyd jî hene ku çiqasî jî dem bêñ derbazbin jî ewana di her demida terî jîr dimînin û bi coşıya gur, bi heytehol têñ qeyd kirin. Jî van cejnan yek yê heyî kevnar cejna Newrozêye. Ev cejin ev çend hezar sale bandorî li ser menewîyata mirovan û gelan dike.

Newroz di dîroka gelê kurdda jî û jîyanâ wanada jî bi gîfîkî kurt jîana kurdanda dewseke hêja gîrtîye û digire. Cejnen ku bi qederâ gelanya, bi rizgarîvê, soreşevâ, têkilîyêñ wan hene, an jî wanva girêdayîve (di alîyê gelanda bi) di bîranîna wanada timê dijî, an jî derbazî jîyanâ wan dibe her dem bi hub û hîzkirin, bi şadîmanî bi coşıyeke alavî tê nitirandin û parastin.

Newroz di efrandarîya gelê kurdanda cîkî pir bi rûmet û siyanet digire. Newroz jîyanâ meda sembola serhîdanê û bûyîna azadîyê, nîşana rîzgarîyê. Newroz destpêka buharê, vejîna tebîtê (siruşt), silava jîyanâ nû û vemirandina sîtemêye. Newroz emrekî bi rûmete, wekhevîye, nêt û meramîn qencin. Newroz-altindarî û parastina mafen mirovan û xwesteka mirovalîyê. Newroz-cejnek dîrokîye. Cejna şehîdane. Newroz-salnama kurd û Kurdistanêye.

Dîrok dide kîşê di berî heyamê me hukumdarên Assûriyayê li ser axa Kurdistanê û li rojhilate da hetanî 400 salî hukumdarî kirine. Berî zayînê 612-salê 2610 sal berîya me 21ê adarê bi serwîtiya mîrxasê lêgêndar Kava xaka Kurdistanê û gelên rojhilate jî bin bandor û dagirkirina Asûriyan têñ azad kirinê. Dû vê altindarîyêra dewleta kurd a yekemîn Mîdiya tê ava kirinê. Jî vê bûyerê şûnda her sal 21-ê adarê tê hesavkirin çawa destpêka edlayê, biratîyê, emrê şâ û aza, roja nû.

Bi kurdî nohroj-Newroze. Bi navê Newrozê girêday gelek lêgênd û cîrok hatine gotine. Jî van lêgêndan yek jî bi navê hedad û engal Kavayêva girêdayîye. Navê Kava sembola azadîyêye li Kurdistanê de. Lêgênd weha destpêde.

... Wextekî li Kurdistanê de bi navê Dehoq hukum darekî zâlimî, bê bext hebûye. Ew gelekî qeddar bûye, hertim bobelat anîye li serî binelfiyêñ Kurdistanê. Rojekê li ser milê wî sîtemkarî du damarê wek mer şîn dibin. Çiqas hekîm û loxman derman çê dikin ku evî hukumdarî devxwîn jî ve zezabê xelazkin. Lê car wî nedibû.

Dawîyêda hekîm û loxman dicivin (beşter) biryar dikin ku hero mîjîyen du xortêñ kurd bidine wan meran ku

bû. ewî bi hesina mirov çêdikir. Kava heyât zarê xwe qurbana Dehoq dabû. Lê vêcarê yê dawîyê ê neha nadî Miqabili Dehoq û bê xwedê cînar û gundiyan beşter dike sozê xwe dikin yek êrîsi li ser quesira wî dikin. Kava çakûcê xweva serê Dehoqê xwînmêj diperçqîne û wî dukuje, leşkerê wî tar-mar dikin. Kava quesra wî zulmkarî de rûdinê dibe hukum dar. Gundî hev dicivin. Kava dibêje: - Îro şûnda li welatê me wê xwîn nerije kesekê sîtem nebîne. emê dewletek, jîyanek nû serrastkin agiran vêxin, govenden bîşînîn bila roja îro, bîst û yekê adarê roja cejnâ be, roja undabûna zordestîye be, destpêbûna emrê şâ û aza be, rînîşa rîzgarîye be Newroz.

Ev lêgênd jî kûraya dîrokê tê.



zirarê nedine hukumdar û wî nexwin. Wê rojê şûnda hero du xorta dukujin mîjûyê wan didine mera. Bineli, gundi di dest wî zâlimî tenegezar dibin.

Rokê dîsa mirovîn wî qedarî têñ ber derê Kava ewladê wî dawîyê dixwazin. Kava mirovîkî hunermend

Lêgêndê da rastî heye. Qewimandin li ser rastîyê, heqîyê hatîye efiandin. Ew rastî îro jî li ser axa Kurdistanê dido me. Gel dijî merê çar ser şer dike. Geç û xortêñ niştimanê bi laşen xwe agrê Newrozê gur tikin û ronayê, azayê di gelî bindest ra tînîn. Îro agrê Newrozê

dilê hemû kurdê welatparêz de vêdikeye û zûtirê li welat agrê azadîyê vêkeve. Belê Kurdistan bi xwîna şeîdanva çêdibe û em her kurdê û namûs şerefeke mezin dikişînin, serkeftin dixwazin û dibêjîn: "Heta dîbî cêleka 40 salî bibe boxê rojekê" an jî "Mirina bi şeref ji emrê bindest çêtire". Belê, heqê kurdan tune vî şerî bidin der. Îro em bi ruhê xwe, bi ramânê xwe, bi nefesa xwe, bi xwîna xwe êrîsi ser merê çar ser dikin, em rîça Kava didimînin. Hesreta me, daxwaza me, ola me, bawerîya me Kurdistanê. Kurdistan gazî dike, hîvî dike, gelê kurd xwe timê pêş dixe, jîyanêra dimeşê û dîroka xwe bi xwîna xwe dinîvsîne. Bi bawerîke mezin jîyanâ xwe didomîne, çandeke nû çêdike, li dîroka mirovahîyê belgeke nû vedike, belga qehremanîyê û vê belgê bi xwîna xwe sore getrancha dix-emiline. belê, îro kurd cejna xwe bi xwîna xweva pîroz dikin. Nêzîkî armancê xwe dibin. Agrê Newrozê dişuxule. Ev agir ese ê bibe meşel di welêt. Em kurd bi bawerî hîvidarê wê roja aza û bi rîzin.

Ew rojê bê...

Ez bawerim ew rojê bê,
Ew qezenza şéidane.
Hêşrên cavêñ dayikane,
Ew hesret û armanca mîlyonane.

Ew bawerîya Mezîlûm Doxan,
Ew daxwaza Rewşen, Alkan.
U rînîşa şéidan,
Ez bawerim ew rojê bê.
Ew hesret gelêmeye,
Ew xelata şerêmeye.
Ew qezenza şéidane,
Ez bawerim ew rojê bê.
Ew rojekê aza nuhe,
Ü rojekê pir bi rîze...
1996.20.3. Barî Teyfûr.

Сегодня мы празднуем Навруз



ся, политика открытого геноцида. Выборы в Ираке показали, что, когда завоеваны условия для свободного волеизъявления, курды способны стать и уже стали мощной политической силой, хорошо знающей свои национальные интересы и добивающейся их настойчиво и последовательно.

К сожалению, в таких странах, как Турция, Иран и Сирия, из этого сделали негативные выводы. Это не обрадовало правящие элиты этих стран, а обеспокоило. Прежде забитые курды, не только борются, но и добиваются своих прав. Пример Южного Курдистана не только обрадовал и вдохновил курдов, но и насторожил и обеспокоил их противни-

ков. Они боятся, что курды, составляющие в этих странах многочисленное население, добьются своих прав и станут играть ту роль, которой они заслуживают. В Сирии усилились провокации и преследования курдов, что проявилось в событиях в Камышлы 12 марта 2004 года. Сегодня войска, которые Президент Асад вынужден убивать из Ливана, направляются в курдские районы Сирии. Смысль этих действий хорошо понятен курдам. Это прямая и очевидная угроза. Вместо того, что признать права курдов и уважать их с арабским населением Сирии, отказаться от политики дискриминации курдского населения, они

усиливают репрессивный аппарат.

Но время прошло, наступление свободы, как и весенний возврат солнца, не остановить. Чем сильнее сирийские чиновники цепляются за свои привилегии, тем меньше у них шансов сохранить свою власть в стране, тем скорее они будут вынуждены повторить судьбу своих коллег из иракского отделения партии БААС. Более продвинутыми оказались власти Турции, которые ради того, чтобы вступить в Евросоюз и получить преимущества принадлежности к Европе, идут на реформы в сфере межнациональных отношений, хотя делают это неохотно и с затяжками. Курдам в Северном Курдистане непросто отстаивать свои права. Но это стало можно делать политическими методами, хотя еще недавно турки понимали только силу. Сравнительно медленно происходят изменения положения курдов в Восточном Курдистане, но и там положение дел меняется к лучшему. В этот праздничный день я хотел бы сказать, что еще десять лет назад, многое из того, что курды имеют сегодня, казалось невероятным. Свобода ускоряет свой бег. Сегодня она бежит к нам на встречу, а не от нас.

Если раньше приходилось воевать с врагами, то сегодня все

большее значение имеет для нас уровень культурного и экономического развития. Мы завоевали свободу на части территории своей страны, часть курдов свободна. Но свободы ждут и других частях Курдистана. Кроме того, в Южном Курдистане нужно сделать жизнь народа процветающей. Повсеместно, везде, где живут курды нужно объединяться, повышать культуру курдского населения, восстанавливать свою литературу, историю, создавать свое кино и делать многое другое. Наш народ никогда не сидел, сложа руки, многое делалось и раньше, но сегодня у нас есть стимул делать все это с удвоенной, утроенной силой. И это можно и нужно делать везде, не только в Курдистане, но и здесь в России. Сегодня каждый может внести свой вклад в рост моци Курдистана. Это радость работать на себя и на свою родину. Если мощно поднимется Южный Курдистан, свобода скорее придет и на остальные земли нашей родины.

Да здравствует Курдистан!
Пусть Навруз принесет счастье всем народам!
Пусть будут счастливы все народы, дружественным курдам!

Бари Тайфур

Bila tu kes hemberî gel nebe asêgeh

Xwandevanê hêja, Mamoste Metleb bona gellên xwe, kar û xebateke berbi çav kir, jîyanaxwe danî ser pêşvaçûna gelên kurd. Lê felekê ew bê wede bir.

Mamoste roja dewata pizmamaxwe, li dewatê çavê xwe jîyanêra girt. Raste ew çû ser dilovanîya xwe, lê gelek armanc nêta wîda hebû biqedîne. Lê felek mecal ne da wekî ew bîgêhêje armanca dilê xwe.

Pirseke kal û bava heye: "Divê meriv heye ji malê diçe lê meriv jî heye ji êlê diçe". Belê Mamoste Metleb ji êlê çû.

Rehma Xudê lêbe.

Gelî xwandevanê hêja, di sala 2006-a mamoste Metleb bûbû mîvanê nivîsxana rojnama "Dîplomat"-ê. Wê demê me hevpeyvînek ji mamoste hildabu, niha em wê hevpeyvînê radigîhînine we.

Mîvanê me Metlebê Çolîye, ew sala 1962-a Komara Nexçivanê, gundê Sûsê hatîye dinyayê, Zaningeşa Êkonomîyê xitim kirîye, zewicîye, sê lawê wî hene. Niha serokê Avtonomîya Kurdên Moskvayêye.

- Kek Metleb, cara ewîn hûn bi xêr hatine nivîsxana rojnama "Dîplomat"-ê.

- Spas dikim û zef şame, wekî hûn li Azerbaycanê rojnameke kurdî, rûsî û azerbaycanî ser navê "Dîplomat"-ê diweşînin û himji we nivîsxana wê amade kirîye. Boy vê yekê ez wera pir eferim dibêjîm û vê xebata pîrozda ji wera serkeftinê dixwazim.

- Kek Metleb, hîvî dikim derbarê jîyana xweda hinek agahî bidine xwendevanê rojnama me.

- Ez sala 1962-a li komara Nexçivanê, gundê Sûsêda ji dayik bûme. Ew gunda gundekî nase, nivîskar û helbestvanê kurdayî eyan Elîyê Evdilrehman derbarê wî gundîda romana xweye "Gundê Mêrxasan" nivîsiye.

- Hûn bi kîjan armancê çûme Moskvayê û ci karê dikin?

- Binelyê gundê me hemû kurdbûn, pişti kutakirina dibistana navîn, ez çûme eskerîyê. Dû wêra hatime Moskvayê. Di ûnîversîtetâ Êkonomîyêda hatime pejîrandin û min ewa xitim kir.

1991-ê salê vîrda min dest pêkir, bi pîrsîrêkîn kurdanva mijûl bûm.

- Kek Metleb, parîkî derheqa kurdên Nexçivanêda biaxîfîn, çend gundên wana hene, rewşa wana çawane?

- Bi gorîya min li Nexçivanê vê gavê anegorî bist û bênc-sî hezar kurd dijin, wedê dewleta Sovêtî gellek kurdên me assîmle bibûn, nasnama wanda pirsa "kurd" nehatibû nîşandayîn.

Lê yên xwe "kurd" dabû nivîsarê jî pirbûn, kurd nêzîkî bîst-sî gundanda, usa jî bajarê Nexçivanê xweda jî jîyanê dikin.

Pişti hilweşîyana Sovêtî rewşa kurdan pir xerab bû. Ji wana gellekan barkirin, berê xwe dane dewleta Rûsîyê, Asîya Navîn û hetanî Sîbirê çûn. Naha Nexçivanêda kurd kêm

mane, ew jî bi heywan xwayîkirinêva mijûlin.

- Hûn çendê salê li Moskvayêda cîwar bûn û ser pîrsîrêka gelê kurdva kîngêva dest bi xebatê kir?

- 1982-da ez çûme Moskvayê. 1988-ê salê li Moskvê bi serkarîya Mehmedê Silo me assosasiya kurdan damezirand, navê wê jî danî "Yekbûn". Wê saziyêda 21 mirovî kar dikir. Hetanî 1991-ê salê karê me dom kir, ji dervayî welêt heval jî hatin, tevî me bûn. Kek Tahir, ne tê bîra min, hûn jî wan civînada besdar dibûn. Hûn jî wan bûyara zanîn.

- "Yekbûn"-ê hetanî kîngê berdewam kir û çima hate teribandin?

- Wê gavê ji serokatiya dewleta Sovêtî mera gîlî dabûn, wekî yê kurdanra Avtonomîyê bidin, hela serbarê serda komissiya jî hatibû çêkirin, serkarê komissiyê Sokolov bû. Ji me kurdan jî wê komissiyêda ci digirt. Lê yekîfiya kurdan xwe hevdî negirt, kesî gurra kesî nekir, her yekî digot "ez". Ji ber wê jî, ew saziya belabû. Pişti wan bûyaran me çend konfrans jî derbaz kir, hezaranya kurd hatine meşan, dîsa boy tunebûna tifaqîya me tu tiştekî berbiçav nehate stendinê.

1994-ê salêda Yekîfiya civaka kurdên Hemûdunayê hate damezirandinê. Xêni vê yekê "Civaka kurdan" yê komarêن Yekîfiya Sovêtî berê hate çêkirin.

- Çend endamên wan saziya hebûn û armancâ wan ci bû?

- Yekîfiyêda danzde mirov ci digirtin. Bi rastî em ewqasî karekî berbiçav jî nakin, lê ci pîrsîreka gel hebe em alîkarîyê didinê.

- Li Rûsîyê çend "Avtonomîya" kurdan heye û helaqetîye we çawane?

- Ez berpirsiyârê "Avtonomîya" kurdên Moskvayême. Xêni wê li Tambovê, Saratovê, Nijîn-Novgorodê, Krasnodarê, li rîspûblika Adigeyê jî "Avtonomîya" kurdan hene.



Metlebê Çolî Osmanov

- Ci helaqetîye we û yên Rêspûblikên Sovêtî berê heye?

- Ya rast, ez şaş mam, wekî we rewseke awa ava kirîyê, ew rewşa we saz kirî, bi rastî qet bal me-li Moskvê jî tune.

Lê gellekî xemgînîyê dikşînim û ber xwe dikevîm, ku Navenda Çanda Kurdê li Bakûyê, kîjan, ku ji alîyê dewletê hatîye damezirandinê tu karê nake, çend caran ez bi xwe çûme wura, min derî dadayî dîtîye.

Lê iro roja rehetîyêye(bazar), nenihêre vê yekê, hûn dixebeitin. Ez dibînim mamocta Egît, Nerîman, Xweşnav, Ramîz, Vîdadî, Refayîl, Akîf, Nîgar xanim, xwendevan Îsmayîlê Tahir, Rasîmê Têmir rojnamê amade dikin. Ji boy xebata we, ji wera zor spas divêjîm. Ev xebata we hêjayî xelatên bilindin. Pêwîst bû, eva xebata Navenda Çanda Kurd bikira

- Hûn derbarê wê çandêda dikarîn ci bêjîn?

- Ez zanim, wekî serkarê çandê Kamile. Berê dîsa pir-hindîkî helaqetîyen me hebû. Rojnama "Dengê Kurd" du meha, sê meha carekê derdiket. Lê naха ewa jî tune. Vê carê hatinê dîsa min dit, ku wê çandêda tu kar nayê meşandin, navê wê jî ji ser dêrî hildane, timê dadayîye. Hurmetâ min mamoste Kamilra heye, lê tu kesek boy pêsta çûyîna çanda gelra tengasiyê gerek çeneke. Nikare karê bike, bila here mala xweda rûnê, gel ji nava xwe xebatkarekî jêhatî, serxwe bibijêre.

Yek jî ez nizanim mirovîn bi zimanê kurdî nizane çawa dibe serokê Navenda Çanda Kurd da? Mirovîn mala xweda bi zimanê dê nikaribe biaxîfe, wê ci bide millet..? Mamoste Kamil ser vê mijarê kûr nebe jî, sîvî bifikire wê baştirbe. Ev pîrsî min digîhîje wan mirovan, kîjan kû ji kurdayetîyê têretêr diaxîfe, lê mala xweda zarokên xweva nikaribe bi kurdî biaxîfe, kurdişîyê hîn bike, gelo wê nava gel çawa ji kurdayetîyê biaxîfe û kurdişîyê hînî netewîke?

- Hûn zanîn li Kurdistana başûr dewleta Kurdan damezirîye, kek Mesûd Barzanî bûye serokê wê, mam Celal Talebanî bûye prezidentê dewleta Îraqê. Ez bi xwe çend

caran çûme Welêt. Hûn, kurdên Rûsîyê evê serkeftinê çawa dinirxînî?

- Eva bona gelê kurdên cîhanê serkeftineke pir girînge, em gellekî şane, dîrokê eva mecalâ daye gelê kurd. Pêwîste hemû kurd bi karûbarê xweva piştgirîyê bidine herdu serokan, boy wê yekê, wekî zûtirekê Kurdistaneke serbixwe bê avakirin.

Bona helbijartina mam Celal Talebanî û Serok Mesud Barzanî me qurban serjekir, şayî derbaz kir û nama pîrozbahîyê şand, ji Xwedê wanara emîre dirêj, can saxî xwestin.

Ez gellekî şame, wekî we îsal cejna "Newroz"-ê derbaz kirîye. Min vîdiyêda mîze kir, dît wekî nêzîkî 200-300 kurd beşdarî eyda "NEWROZ"-ê bune. Berê, Navenda Çanda Kurd salê sê-çar caran eyd, konsîr, civat derbas dikir. Koma folklorê, koma dîlanê, qursîn zimanê kurdî hebûn, lê ci bi wan hat?

Ya rast, hun kareke berbiçav dimeşînin. Ji ciyê tune we ev mecal saz kirîye. Min tîlevîziona "Kurdistan TV"-da dît, wekî we, mamosta Egîtva li Kurdistanê pirtûka V.F.Mînoskîy "Kurd û Kurdistan" û kitêba mamosta Egîtê Çerkez "Çima" cara duyemîn paytexta Kurdistanê, Hewlêrêda da weşandinê. Dîsa kitêba M.İ.Şemsî "Şeref xan Bîlîsî "SEREFNAME" çav kanîya dîroka gelên kurd". Ûsa jî V.F.Mînoskîy we wergerandiye ser zimanê azerî. Evan kirinê we xebatên pir mezinin,

Lê ev karana yê Navenda Çanda Kurde wekî ewana bikin. Ya rast, şabuneke mezine, wekî iro we evan karana kirine û hun mehî dû cara rojnamê diweşînin. Eva ne kû seva min, ûsâ jî bona hemû gelê me kurdan karekî gellekî mezin û girînge. Ez hîvîdarim, wekî hûnê wedekî kurtda rojnamê bikine hefteyane. Em dibînin, dibîzin ku, dengê rojnamâ "DÎPLOMAT"-ê ji Qazaxistanê, Krosnodarê, Qırqızistanê, Gurcistanê, Nexçivanê, Saratovê, Îraqê, Turkîyê dengêwî tê. Ez dîsa diwekilînim, eva kareke pîroze. Vê rîya pîrozda wera serkeftinê dixwazim û spas bibejim.

- Spas boy hevpeyvine. *Hevpeyîn bir: Tahir Silêman*

Serok Barzanî: Îradeya gelê Kurdistanê ji çekên kîmyayî û müşekanbihêzir e

Serok Barzanî bi boneya 34emîn salvegera kîmyabarankirina Helebcê ragihand, "îradeya gelê Kurdistanê ji çekên kîmyayî û firoke û müşekanbihêzir e."



Serok Mesûd Barzanî iro Çarşema 16.03.2022 ji bo bibîrânîna 34 saliya kîmyabarankirina Helebcê li hejmarâ xwe ya Twitterê peyamek belav kir.

Serok Barzanî dibêje, "Dijmin Helebcê kîmyabaran kir lêbelê azadîxwazîya gelê Kurdistanê her zîndî ma."

Di dewama peyama xwe de Serok Barzanî tekez dike, "Di bîrânîna 34 saliya şehîdkirina Helebcê de dûpat dîkin ku îradeya gelê Kurdistanê ji çekên kîmyayî û firoke û müşekanbihêzir e." Hewlîr-KDP.info

Li Diyarbekirê Newroz bi coşî û pêşandana sembolên netewî hat pîrozkirin

Ahenga Newrozê ya herî mezin li Bakurê Kurdistanê îsal jî wek salêñ borî roja 21ê Adarê li Diyarbekirê hat lidarxistin.



Di dema kombûna li Qada Newrozê de, ji ber sembolên kurdi û cilûbergên kurdi, ji aliye polîsan ve dema çûyîna nav qada Newrozê astengî hatin derxistin û bi avê û gaza rondîkrê destwerdan hat kirin.

Lê belê dîsa jî bi hezaran welatiyênu ku ji gelek devêrîn din ên Bakurê Kurdistanê jî hatibûn derbasî qada Newrozê bûn û bi govend û şahiyan Newroza xwe pîroz kirin. Herwiha di ahenga Newroza Diyarbekirê de sembolên netewî yên Kurdî jî hatin pêşandan û ala Kurdistanê jî li gelek deverê qada Newrozê hat hildan.

PeyamaKurd

Li Akrê ya Paytext Newroz bi heybet hat pîrozkirin!

Li paytexta Newrozê Akrê ya navçeya Duhokê ya Başûrê Kurdistanê îsal jî Newroz bi heybet hat pîrozkirin.



Ji her parçeyê Kurdistanê û derveyî welat Kurdekerîn Akrê û işev ciwanan bi sedan meşaleyê agirê Newrozê li dora çiya gerandin. Di pîrozbahya şeva 20 Adarê şeva 21ê Adarê ya Cejna Newrozê de, ala Kurdistanê ya rûbera wê 100 metre bû, di demjmîrêne êvarê de ji aliye ciwanan ve li ser çiyayê Girê Top, Kelê û Kela Kewvîn hat hildan. Herwiha bi fişekîn rengîn jî asmanê Akrê hat xemilandin û şahiya Cejna Newrozê gîhîşt lutkeyê.

PeyamaKurd

Nêçîrvan Barzanî Cejna Newrozê pîroz kir

Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî peyamek belav kir û Newroz li malbatên serbilind ên şehîdan, gelê Kurd û li tevahiya gel, pêkhate û Pêşmergeyên mîrxas ên Kurdistanê pîroz kir û got, "Parastina maf, destkeft û statuya Herêma Kurdistanê berpirsiyariya hevbes ya me hemûyan e."

Peyama Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî wiha ye: "Cejna Newroz û sersala nû ya Kurdî gelek bi germî û ji dil li malbatên serbilind ên şehîdan, li gelê Kurd û li tevahiya gel, pêkhate û Pêşmergeyên mîrxas yê Kurdistanê pîroz dikim. Hêvîdar im hemû bi hev re digel xweştîv û ezîzên xwe cejneka bi xweşî di nav aramî û seqamgîriya Kurdistanê da derbas bikin.

Ez daxwazê ji welatiyê ezîz dikim ku di dema derketina derve û geşt û seyranen di nav xwezaya xweşik a Kurdistanê de, hindî ji wan bê pêgîriyê bi paqîjî, bijîniyê û parastina jîngeha dil-veker ya bihara welat bin, li xwe miqate bin û xweparêzî û rînîmayîyen saxlemiyê li ber çavan bigirin.

Newroz ku cejna Azadî û nîşana berengarbûn û bawerî bi xwe hebûnê ye, sala nû û nûbûn e, li ser asta tak û kesî, bila paldera nûbûna hîzr û ramanen me hemûyan be û bikîn destpêkek nû ji bo jiyan û têkiliyêne, ji bo aştiyê hêvî û geşbînî û ji

Hevseroka Partiya Demokratik a Gelan (HDP) Pervîn Buldan di ahenga Newrozê ya Diyarbekirê de axaftinek kir û got, "Pirsgirêka herî mezin a vî welatî pirsa Kurd e. Yê dibêjin pirsgirêka Kurd nîne, divê bizanin ku wiha nayê çareserkirin. Pêdivî bi çareseriyeke lezgîn heye."

Pervîn Buldan wiha axivî: "îro pirsgirêka herî mezin a vî welatî pirsgirêka Kurd e. Yê dibêjin me vê pirsgirêka çareser kirye, bila baş bizanibin ku ev pirsgirêka wiha nayê çareserkirin. Bi lezgîn pêdivî bi çareserkirina pirsgirêka Kurd heye."

Buldan diyar kir, "Em ji bo çareserkirina hemû pirsgirêkan amade ne. HDP partiya çareseriye ye. Em ji vê re amade ne. Bi înakar, zext, zor, girtîgehan ev pirsgirêka çareser nabe. Heke hûn îradeya gelekî bixin zindanan, wê çaxê pirsgirêka çareser nabe. Divê

bikeve. Hûn nikarin bi înakar û zilmê van qadan vala bîhelin. Vaye qad tije ne û daxwazên xwe tînîn ziman."

Hevseroka HDPê got ku ew ê axaftina xwe anî: "Ez carek din dibêjim ku ev Newroz bibe wesîleya azadî, aşî û edaletê. An serkeftin an serkeftin. Jin jiyan azadî."

PeyamaKurd

bo çawaniya muamelekirin digel pêşhat û bûyerêner derdora me da. nakokian digel hikumeta federal ya Iraqê bi diyalog û li ser bingeg-



Li ser asta gişî jî, ji hemû deman zêdetir erkê hêz û aliyêni siyasi û pêkhateyên Kurdistanê bi gişî ye ku yekrêz û hevgirtî bin û bi hevbesî bi hevre ji bona em hemû bi yekgirtî rûbirûyê dijwarî û gefan bibîn û bi serkeftî jê derbas bibîn kar bikîn.

Parastina maf û destkeftiyan û qewareyê destûrî û siyasi yê Herêma Kurdistanê, wekî ka çawa berhemê tekoşîna hemû Kurdistaniyan e, her wiha jî berpirsiyariya hevbes ya me hemûyan e daku bi hevre ber bi paşerojeka baştır û ronahîtir bi dilrehetî pêngavan bavêjîn û serbikevîn.

Bi vê helkeftê, careke din tekîd dikin ku Herêma Kurdistanê wek her tim berheve hemû pirsgirêk û

hê destûrê çareser bike. Herêma Kurdistanê, weke hertim, ji bo pirsgirêkîn Iraqê faktê çareseriye dibe û ji bona aramî û seqamgîriya welatî alîkar û hevkar dibe.

Her li vir, ji Kurdistanê lêborîn, hevqebûlkirin û pêkvejiyanê rîz û silavên Newrozê û bîhnêñ biharê, ji bo gelên Iraq û deverê, cîhan û dostêñ gelê Kurdistanê li her dera lê bin, her wisa, ji bo Neteweyê Yekgirtî ku cejna Newrozê kiriye rojekê navdewletî dinêrîn û digel hemûyan ji bona aramî, seqamgîrî û aştiyê kar dikin.

Newroz li hemûyan pîroz be û hemû salan bi xweşî be.

**Nêçîrvan Barzanî
Serokê Herêma Kurdistanê
20 ê Adara 2022" Hewlîr-KDP.info**

Buldan: Pêdivî bi çareseriya lezgîn a pirsa Kurd heye, em jê re amade ne!

hûn bi muxatabê pirsgirêkê re rûnin û dê wê çaxê çareserî li pêş

demokrasî, azadî, edalet û aştiyê bînîn vî welatî û wiha dawî li



Serok Barzanî ligel zarokên şehîdan Agirê Newrozê pêxist!

Serok Mesûd Barzanî li ahenga Cejna Newrozê ya parka Şaneder li paytexta Hewlîrê agirê Newrozê pêxist.

Serok Barzanî û Serokwezîr Mesrûr Barzanî iro Yekşemê 20ê Adarê besîdarî ahenga Newrozê ya li Parka Şaneder bûn.

Serok Barzanî danê êvarê agirê meşaleyâ ahenga cejna Newrozê ligel hejmarek zarokên şehîdan pêxist.

Şahiyan Cejna Newrozê işev li Hewlîrê, Duhokê, Silêmanî, Helebcê û gelek deverê din ên Herêma Kurdistanê berdewam dikin.



PeyamaKurd

Serok Barzanî Newroza hemû perçeyên Kurdistanê pîroz kir



Serok Mesûd Barzanî bi boneya hatina cejna Newrozê peyamek belav kir û tê de germtirîn pîrozbahiyêne xwe pêşkêşî malbatêne serbilind ên şehîdan, Pêşmergeyêne qehre-

man û welatiyêne xweşdivî yên Kurdistanê li navxwe û derve û hemû perçeyên Kurdistanê kir.

Di peyama Serok Barzanî de Hat: "Bi helkefta hatina cejna Newroz û serê sala 2722 ê Kurdî germtirîn pîrozbahiyêne xwe pêşkêşî malbatêne serbilindêne şehîdan û Pêşmergeyêne qehreman û welatiyêne xweşdiviyêne Kurdistanê li navxwe û derve û hemû perçeyên Kurdistanê dikim û hîvîya xweşî û kameraniyê ji bo wan dixwazim."

Herwiha Serok Barzanî hîvî xwast ku ev cejin cihê xêr û aramî û bexteweriya hemû aliyan be û aştî û birayetî bi ser welatê me û navçeyê de bîne. **Hewlêr-KDP.info**

Newroza Amedê: Heta dawiyê berxwedan!

Siyasetmedar Ahmet Turk di Newroza Amedê de axivî û got "Em ê hebin, em ê heq û hiqûqa xwe bi dest bixin. Em ê heta dawiyê li ber xwe bidin." Ligel astengî û provokasyonê Emniyeta Amedê gel astengî derbas kir û tevlî Newroza Amedê bûn. Bi sed hezaran kes li qadê kom bûn û li ber stranê Hozan Kazo govend gerandin.

Partiyêne Kurdistan ên di nav Koma Tifaqa Kurdistanê de derketin ser dikê û gel silav kirin. Siyasetmedarê Kurd Ahmet Turk jî derket ser dikê û gel silav kir. Ahmet Turk di pîrozbahiyê de axivî û got "Ez bi germahiya agirê Newrozê we silav dikim. Jin û ciwan ji bo pêşeroja gelê Kurd û ji bo azadiyê li ser pêyan in. Ji bo azadiya Kurdistan em hemû li ser pêyan in. Ez berxwedana we silav dikim."

Turk di dûmahiye axaftina xwe de got "Li ser rêzdar Ocalan 5 sal in tecrîd heye. Malbat û parêzeren wî nikarin biçin hevdît-

inê. Wê gelê Kurd vê siyasetê pûc bike. Di heman demê de hevala me Aysel Tûglûk di girtîgehê de ye û nexweş e.



Tîştekî mirovî û exlaqî nemaye. Ji dêvîla ku divê were berdan lê ew di bin zilmê de ye.

Li ser Kurdistan zextêne giran hene lê siyasetmedarêne Kurd li çar parçeyan nikarin bibin yek. Em ji Amedê bang dikin, êdî dem hatiye ku em werin ba hev û

hiqûqeke hevpar ava bikin. Heke hûn wisa tevbigerin wê dîrok û gelê Kurd we efû neke. Divê li gorî serdemâ nû siyaset were afi-

randin, siyasetâ demokratik were xurtkirin û li dora nirxên hevpar gelê me bibe yek. Ez dixwazim hûn ji vî tîşî bawer bikin. Ev desthilatdar wê biçe. Em ê hebin, em ê heq û hiqûqa xwe bi dest bixin. Em ê heta dawiyê li ber xwe bidin." anfkurdi.com

Îro 4emîn salvegera dagîrkirina Efrînê ye

Tirkiyê û komên çekdar ên girêdayî wê, di 20 Çileya 2018an de êrîşî ser Efrînê kirin û piştî şerê 58 rojan, Efrîn hat dagîrkirin. Ji hezar welatiyêne Kurd zêdetir kes di enca ma dagîrkirinê de li Efrînê şehîd û birîndar bûn, ji 250 hezar welatiyan zêdetir jî, bi neçarî derbider bûn. Heta niha jî binpêkirinê mirovî li Efrînê berdewam in û bi hezaran welatiyêne Efrînê hatine revandin.

Artêşa Tirkiyê, di roja 20.01.2018an de, bi top û moşekan gund û navçeyêne Efrînê Raco, Şiyê, Bilbilê, Şera, Cindirêşê, Mabeta û Şêrewa topbaran û bombebaran kirin û komên çekdar ên opozîsyona Sûriyê yên girêdayî Tirkiyê, dest bi êrîşa bejahî li ser Efrînê kirin.

Di êrîşê de, malên sivilan, dibistan, avahiyêne fermî, nexweşxane, mizgeft, cihêne dîrokî û pîroz û jêrxana Efrînê hatin bomebarankirin û wêrankirin.

Amarêne hatine belavkirin dest-nîşan dikin, ji ber êrîşê ji 300î zêdetir welatiyêne Efrînê yên sivil şehîd bûn û ji 700î zêdetir sivil jî birîndar bûn. Herwiha zêdetir ji 250 hezar Efrînî jî bi neçarî koçber û derbider bûn, beşek mezin ji wan li gundêne navbera Efrîn û Helebê de man û beşek di jî li heman deverê di kampan de hatin bicîhkirin.

Artêşa Tirkiyê û komên çekdar ên girêdayî wê, piştî şerê 58 rojan, di roja 18ê Adara 2018an de, der-

başî bajarê Efrînê bûn û dagîr kirin û dest bi dizî û talana mal, avahiyêne fermî, dikan û samanêne welatiyêne sivil kirin.

Ji roja 18ê Adarê ve, welatiyêne Efrînê di metîrsî û di bin gefê de dijîn. Bi mebesta standina pereyan ji malbatêne Efrînî bi hezaran xort û keçenê Kurd ji aliye komên çekdar ve hatin û têne revandin û rastî eşkencyan têne. Li gor amarêne çalakvanan, ji 7 hezaran zêdetir welatiyêne Efrînê di vê heyama borî de hatine revandin û heta niha çarenivîsa ji 2 hezaran zêdetir perçeyêne entîka dizîne û veguhastine Tirkiyê.

Li Efrînê gelek cihêne dîrokî hene, ji bilî Keleha Horî, keleha Samanê, şikefta Duderî, kenîseya Marmaron û bi dehan şûnwarêne din. Nêzîkî 25 girêne dîrokî hene, piraniya wan di ber çemê Efrînê re rîzkirî ne, ku dîroka wan vedigere hezar heta 2 hezar berî zayînê, piraniya wan giran bi alavêne kolandinê hatine kolandin û têkdan û komên çekdar beşek ji wan giran jî Kirine navendêne serbazî.

Hêjâyî bibîrxiştinê ye, di van her 4 salêne dagîrkirina Efrînê de, ji ber topbaran û bombebarana artêşa Tirkiyê û kiryarêne komên çekdar:

Nêzîkî 700 sivilan hatine kuştin 7 hezar û 400 kes hatine revandin ku çarenivîsa nîviya wan nedîyar e

68 dibistan wêran bûne
28 pêgehêne şûnwarî hatine jînaybirin

15 mezargehêne olî li gel hejmareke goristan têk çûne

1 milyon 300 hezar darêne biber û bêber hatine birîn **PeyamaKurd**

Ji Nêçîrvan Barzanî peyama Newrozê: Parastina statuya Herêma Kurdistanê berpirsiyariya me hemûyan e

Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî peyameke pîrozbahtiya Cejna Newrozê belav kir ku tê got, "Parastina maf, destkeft û statuya Herêma Kurdistanê berpirsiyariya hevbeş ya me hemûyan e."



Serokê Herêma Kurdistanê di peyama xwe de diyar kir: "Newroz ku cejna azadî û nîşana berengarbûn û bawerî bi xwe hebûnê ye, sala nû û nûbûn e, li ser asta tak û kesî, bila paldera nûbûna hîzr û ramanêne me hemûyan be û bikîn destpêkek nû ji bo jiyan û têkiliyêne." Nêçîrvan Barzanî destnîşan kir: "Parastina maf û destkeftiyan û qawareyê destûrî û siyâsî yê Herêma Kurdistanê, wekî ka çawa berhemê tekoşîna hemû Kurdistanîyan e, her wiha jî berpirsiyariya hevbeş ya me hemûyan e daku bi hevre ber bi paşerojeka baştîr û ronahîtir bi dilrehetî pêngavan bavêjîn û serbikevîn."

Serokê Herêma Kurdistanê di peyama xwe de wiha got: "Cejna Newroz û sersala nû ya Kurdî gelek bi germî û ji dil li malbatêne serbilind ên şehîdan, li gelê Kurd û li tevahiya gel, pêkhate û Pêşmergeyêne mîrxas yên Kurdistanê pîroz dikim. Hêvîdar im hemû bi hev re digel xweştiyî û ezîzen xwe cejnaka bi xweşî di nav aramî û seqamgîriya Kurdistanê da derbas bikin."

Ez daxwazê ji welatiyêne ezîz dikim ku di dema derketina derve û geşt û seyranêne di nav xwezaya xweşik a Kurdistanê de, hindî ji wan bê pêgîriyê bi paqîjî, bijîniyê û parastina jîngeha dilveker ya bihara welat bin, li xwe miqate bin û xweparêzî û rînimayiyêne saxlemyî li ber çavan bigirin."

Nêçîrvan Barzanî da zanîn: "Parastina maf û destkeftiyan û qawareyê destûrî û siyâsî yê Herêma Kurdistanê, wekî ka çawa berhemê tekoşîna hemû Kurdistanîyan e, her wiha jî berpirsiyariya hevbeş ya me hemûyan e daku bi hevre ber bi paşerojeka baştîr û ronahîtir bi dilrehetî pêngavan bavêjîn û serbikevîn."

Di dawiyê de jî Nêçîrvan Barzanî diyar kir: "Her li vir, ji Kurdistanâ lêborîn, hevqebûlkirin û pêkvejîyanê rez û silavê Newrozê û bîhnê biharê, ji bo gelên Iraq û devêrê, cîhan û dostêne gelê Kurdistanê li her dera lê bin, her wisa, ji bo Neteweyê Yekgirtî ku cejna Newrozê kiriye rojeke navdewletî dinêrîn û digel hemûyan ji bona aramî, seqamgîrî û aştiyê kar dikin." **PeyamaKurd**

Kerkük.. Cejna Newrozê hat pîrozkirin



Îro yekşemê xelkê Kerkükê ji hemû pêkhate û mezheb besdari şahiya mezin ku bi boneya salvegera azadkirina Kerkükê di serhildana dîrokî û cejna Newrozê bi serperîstiya Yekîtiya Niştimaniya Kurdis-tanê û partiyêne kurdi yên li bajêr hate lidarxistin, bûne.

Di pîrozbahiyê de ku endamê desteya kargêrî ya Mekteba Siyâsî ya Yekîtiya Niştimaniya Kurdistanê serperîstiya Kerkükê Aso Mamend, Selahedîn û Endamê Mekteba Siyâsî Xalid Şwanî, serkirdeyê Yekîtiya Niştimaniya Kurdistanê amade bûn. Yekîti û nûnerên partiyêne Kurdistanê bi sirûda netewî (Ey Reqîb) dest pê kir û piştre Aso Mamend axaftina partiyêne Kurdistanê yên li Kerkükê kir û pîrozbahtî li beşdaran kir. Herwiha tekezî li ser Kurdistanîbûna Kerkükê kir û cîbicîkirina maddeya 140 ya destûra hertimî û destkeftina posta parêzgeriya kerkükê yê kurde, piştre agirênewrozê hate vêxistin, ışahî hat lidarxistin.

Ji aliyeke din ve tedbîrên asayişê ji aliye asayışa Kerkükê ve bi mebesta encamdana vê cejna mezin a li bajarê Kerkükê hate girtin. **pukmedia.com**

Mesrûr Barzanî Newroz pîroz kir

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî bi helkefta cejna Newrozê peyamek belav kir. Serokwezîr Mesrûr Barzanî bi helkefta hatina Newrozê peyamek belav kir. Peyama wî wiha ye:



"Bi minasebeta cejna Newroz û sersala nû ya Kurdî, germtirîn pîrozbayiyên xwe pêşkêşî tevahiya Kurdistanian, bi taybetî pêşmergeyên qehreman, hêzên asayışa navxwe û kesûkarên serfiraz yên şehîd û enfalan dikim.

Hêvî dikim rojên cejnê di nava rewseke aram, şadî û xweşî de biser berin, daxwaz ji welatiyan dikim di dema seyranê de paqêjiya jîngîhê biparêzin û rîkarêن hatinçûnê jî cîhbîcîh bikin. Di dirêjahiya dîrokê de Newroz bo gelê Kurdistanê herdem sembola berxwedan, rûbirûbûna sitem û zordariyê û domandina xebat, azadî û rizgarbûnê bûye. Gelê Kurdistanê niha jî berdwam e li ser xebatê bo parastin û berevanîkirin ji mafêñ xwe yên destûrî, bi ti awayî jî ne amade ye di bin ti zextekê de dev ji xwestek û mafêñ xwe yên netewî berde. Bi minasebeta Newrozê careke din em diyar dikin ku Herêma Kurdistanê weke her car faktereke girîng ya aramî û aştiyê li deverê de dibe û ti car nabe sedema gef û metirsiyan bo ti aliyeke, belku berovajî herdem li kîleka berevanîkirin ji mafêñ xwe yên destûrî, xwedan roleke girîng û berçav jî bûye bo pêşdebirina çanda lêborîn û bihevre jiyana aştiyane ya di navbera pêkhateyên curbicur yên Herêma Kurdistan û Iraqê de.

Newroza we pîroz be, Xwedayê mezin Kurdistan û Kurdistanian biparêze."

Hewlîr-KDP.info

Mazlûm Kobanî: Em ê bi vê hevgirtinê tekoşîna xwe bibin serkeftinê

Fermandarê Giştî yê HSDê Mazlûm Kobanî peyamek li ser Newrozê belav kir û qala rewşa Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî kir û diyar kir: "Em ê bi vê hevgirtinê tekoşîna xwe bibin serkeftinê."



Mazlûm Kobanî ji bo Cejna Newrozê got: "Gelê me û dostêñ xwe agirê Newrozê bi yek dest û dengî geş dike. Em ê bi vê hevgirtinê tekoşîna xwe bibin serkeftinê." General Mazlûm Kobanî eşkere kir: "Bi ROJA NÜ re em israra xwe ya parastina nîrxêñ şoreşê nû dikan."

Herwiha Mazlûm Kobanî amaje bi rewşa bajarêñ Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî yê Rojavayê Kurdistanê kir û diyar kir: "Heya em agirê Newrozê li Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî geş bikin, Newroza Serfiraziyê pîroz be." Peyama General Mezlûm Kobanî:

Gelê me û dostêñ xwe agirê Newrozê bi yek dest û dengî geş dike. Em ê bi vê hevgirtinê tekoşîna xwe bibin serkeftinê. Bi ROJA NÜ re em israra xwe ya parastina nîrxêñ şoreşê nû dikan.

PeyamaKurd

Mezlûm Ebdî û berpirsê Amerîki agirê Newrozê pêxistin



Li bajarê Hesekê yê Rojavayê Kurdistanê, Cejna Newrozê bi besdariya nûn-erên Amerîka û fermandarê Hevpeymaniya Navdewletî hat pîroz kirin. Di ahengê de agirê Newrozê ji alîye Fermandarê Giştî yê HSDê Mezlûm Ebdî û Berpirsê Rojhilata Navîn ê Amerîkayê di Wezareta Derve de Matthew Pearl ve hat pêxistin.

Herwiha di ahenga Newrozê de ji bilî fermandar û efserên hevpeymaniye Endamê Konseya Rêveber a PYDê Salih Muslim jî besdari kir.

PeyamaKurd

Serok Barzanî û Mesrûr Barzanî besdari ahenga Newrozê ya Hewlîrê bûn

Li Başûrê Kurdistanê pîrozbahiyêñ Cejna Newrozê li hemû bajar û bajarokan berdewam dikin.

Serok Mesûr Barzanî û Serokwezîr Mesrûr Barzanî jî besdari ahenga pîrozkirina Cejna Newrozê li Hewlîrê birêve çû bûn.

Şahiya Newrozê li Hewlîrê li parka Şaneder bi ahengeke mezin tê pîrozkirin ku Serok Barzanî, Serokwezîr Mesrûr Barzanî, Wezîrê Navxwe Rêber Ehmed, Parêzgarê Hewlîrê Umêd Xoşnaw û geleb berpirsêñ din yên Kurdistanê tê de besdari kirin.



Ahanga Newrozê ya Hewlîrê xelkê Hewlîrê heta êvarê wê bi besdariya hunermendan û berdewam bike.

PeyamaKurd

Rejîma Îranê di Newrozê de ala Kurdistanê û sirûda netewî ya Kurd qedexe kir

Rejîma Îranê, ji bilî merasîmên fermî yên Newrozê astengî ji



xelkê Rojhilatê Kurdistanê re derxistin û rî nadî Cejna Newrozê bi awayekî netewî ji alîye Kurdan ve were pîroz kirin.

Îranê ji bilî danîna mercê moletê bo ahengê Newrozê her-

wiha bilindkirin ala Kurdistanê û gotina sirûda Ey Reqîb a netewî

ya Kurd jî di pîrozbahiyê Newrozê yên li Rojhilatê Kurdistanê de qedexe kir.

Berpirsêñ hikûmeta Îranê ji çalakvan û organîzatorên Newrozê re gotine, nabe di

pîrozbahiyen de alaya Kurdistanê were bilindkirin û sirûda Ey Reqîb were gotin. Her wiha ew kesen ku gotaran pêşkêş dikin, divê "bi dilê me bin!".

Rejîma Îranê li hinek deveran ji bi taybet li gundê Nê yê Merîwanê, ku gundekî geştiyârî yê navdar e li Rojhilatê Kurdistanê, ji nêzîkî 100 kesan re gotiye, nabe bi ti rengî tevlî merasîmên Newrozê bibin û belge bi wan daye îmzekirin.

Li gorî çavkaniyêñ Rojhilatê Kurdistanê li deverên Kurdistanê ci merasîmeke Newrozê hebe ji alîye pasdaran ve tê kirin û bi tundî tê çavdîrîkirin.

Pasdaran ji xelkê re gotiye, îsal hûn bi serê xwe Newrozê pîroz bikin, divê li cihêkî kom bin û di pîrozbahiyen de jî pesnê rîberê Îranê Elî Xaminêyî û Qasim Suleymanî bidin.

PeyamaKurd

Pîrozbahîya serokê BERBANGê bo NEWROZê

Banga Profêstor Ezîzê Zîyo Bedirxan bo xurtkirina hevgirtina kurdan Ev cejina gelên Arî di ber dilê kurdan da ewaqs ezîz e, ku ji qalibê cejina biharê derketîye û bo kurdan bûye cejina azadîyê, serxwebûnê, hevgirtinê. Anglo, cejina gelê meyî sereke. Di hêleke din va jî ev cejina biharê, vejînê û nûbûnê ewqas li gelên ne Îranî xweş hat, ku wan jî destpê kir ev cejin pîroz bikin.

Yek ji wan gelan jî, ku Newrozê bi çôş pîroz dike, gelê qazax û hemû gelên Qazaxistanê ne, ku me - kurdan li vî welatê dost û xêrxwaz di hêla pêşxistina çanda xwe da hemû mafêñ xwe sitendin û bi serfîrazî pêş dixin.

Bo kurdên Qazaxistanê ev cejina pîroz me bi welatê me, bi xwezaya me, bi koka me va dide girêdan. Welatparêzîya me gîhîştîye wê astê, ku em her karêñ xwe yên kurdperwerîyê bi welatê xwe, bi rîberên xwe va didine girêdan.

Tevbûna kurdên Qazaxistanê di nava karûbarê Revenda Kurdistanê da me diha nêzîkî hevdû dike. Ez wek yek ji endamên Komîtêya Karger ya wê rîxistina hevgirtina kurdên welêt û dervayî welêt, ezê hewil bidim dîsa rastî serokatîya Kurdistanê - Rîberê tevaya gelê Kurd Mesud Barzanî, Serokkomar Nêçîrvan Barzanî, Serokwezîr Mesrûr Barzanî bêm bona germahîya diyaspora kurdan bi welêt ra xurttir bibe.

Di van rojên Newrozê da mizgîneyeke me bo

gelê me heye. Em destbi weşana BERBANG-TV'ye dikin. Em bawer in, ku weşana me wê di nava hemû



kurdên cihanê da hevhezkirinê, hevgirtinê xurttir bike, ji ber ku emê hewil bidin bi karê xwe va xizmetî tevaya kurdên cihanê bikin, angó ewê bibe TV ya hemû kurdan.

Ji bo wê jî abone bin, piştgir bin, me bişopînin, weşana me ya xwe bihesibînin, ji ber ku ewê bibe çeka me ya çandî, edebî, civakî ya here xurt.

Serokê Yekîtiyâ kurdên Qazaxistanê - "BERBANG"

Doktor-profêstor Ezîzê Zîyo Bedirxan

Peyama Pêşmergeyêñ Roj..

Fermandariya Leşkerêñ Roj bi minasebeta Cejna Newrozê daxûyanîyek ji bo Raya Giştî kir. Daxûyanî: Bi helkefta Cejna Newrozê, Cejna Sersala Kurdi, cejna azadî û rizgariyê, em pîrozbahiyek germ arasteyi gelê xwe yê Kurd dikin, her weha li, sembola dastana xebat û têkoşîna Kurdi, serok Mesûr Barzanî

û malbatêñ pakrewanan û Pêşmergeyêñ qehreman il qadêñ têkoşînê bi serfirazi berdewama bin di erkê pîroz de, herwiha saxlemî ji bo birîndaran. Em hêviyê ji Xwedayê mezin dikin ku ev cejna hezkirin, lêbûrîn û hevbiratiyê be, herwiha Kurdistan bi asayış, ewlehî û aramîyê geş û şad be.

rojekurd.com

'Zerdeşti atesi' ile 'Newroz atesi'nin farkı...

Ezîz Muradî (BasNews)

- Ateş, doğanın dört temel unsurundan biridir. Zerdeşiler ve Kürtistan halkları için ateş kutsaldır ve ona özel bir saygı duyulmalıdır. Bütün bayram merasimlerinde ateş vardır. Özellikle 'Çarşema Sor' (Kızıl Çarşamba) ve Newroz kutlamalarında ateş ön plandadır. Zerdeşiler, ateşin kutsal bir değer olduğuna inandıkları için çoğu insan Zerdeşilerin ateşe taptıklarına inanır.

